**Nûnerê ji bo Azadiya Çapemeniyê**

Bi helkefta sêyemîn Kongireya Internêtê ya Nûnerê ji bo Azadiya Çapemeniyê yê OSCE li Amsterdamê (17-18.06.2005)

DAXUYANIYA HEVBEŞ A **NÛNERÊ JI BO AZADIYA ÇAPEMENIYÊ YÊ OSCE** Û **PEYAMNÊRÊN BÊSÎNOR** DERBAREY MISOGERKIRINA AZADIYA ÇAPEMENIYÊ DI INTERNÊTÊ DE

1. Her qanuna li ser belavkirina agahiyan di internêtê de divê li ser bingeha mafê azadiya derbirînê hatibe çesipandin, li gorî mada 19ê ya Danezana Cîhanî ya Mafên Mirovan.

2. Di civateke demoqratyane û vekirî de, welatî bi xwe biryarê didin, bê ew dixwazin derbasî internêtê bibin an tê de li çi binerin. Qedexekirina malperan an teqyîmkirina berhemên internêtê ji aliyê hikumetan ve nayê pejirandin. Gerek tenê bikarhênerên internêtê bikaribin rê li ber hin malperên ku ew dixwazin bigirin. Her siyaseta rêlibergirtina malperan – ku di asta neteweyî yan jî herêmî de be jî – li dijî prensîpa belavkirina azad a agahiyan e.

3. Doza qeydkirina malperan ji aliyê hêzên hikumî ve nayê pejirandin. Berevajî tiştên ku ji bo televizyon û radyo pêk tê, hebûna bingeha jêrîn a mezin a internêtê derxistina desturên fermî naberirîne. Berevajî vê yekê, mecburkirina qeydkirina weşaneke internêtê dikare danûstendina azadyane ya raman, nerîn û agahiyan di internêtê de asteng bike.

4. Divê devera teknîkî ya ku xizmeta internêtê belav dike nebe berpirsyara gihandin an hembêzkirina weşanên internêtê, eger wê pêkanîna biryareke dadgehê qebul nekiribe. Tenê dadgeh biryarê dide, bê malperek rewa ye yan qedexe ye, ne belavkerê xizmeta internêtê. Gerek ev gavên qanunî vekirîbûn, berpirsyarî û mafê berdewamkirina gilîkirinê misoger bikin.

5. Gerek qanunên welatekî tenê ji bo weşanên internêtê yên ku li wî welatî têne hildan (upload), bêne bikaranîn. Nabe ku ew qanun li ser wan weşanan bêne bikaranîn, ku li wî welatî hatine daxistin (download).

6. Internêt şêweyên cuda ji çapemeniyê hembêz dike, û amûrên weşanê yên nû mîna blog peyda bûne, ku her ku diçe, bikaranîna wan bêtir dibe. Ji ber vê yekê gerek nivîskar û rojnamevanên internêtê ji aliyê qanunê ve bêne paraztin, li ser prensîpên bingehîn ên mafê azadiya derbirînê û hemî mafên mîna nepenî û paraztina çavkaniyan.

Wergera ji ingilîzî: Sîrwan Hacî Berko, Elmanya, (www.siruan.de)